

***Pêrist***

Pêşgotin ----- 2

**Gotar û lêkolîn**

- 21ê Sibatê ----- Mistefa Henan 4  
- Zeredeşt ----- Dr: Rozad Elî 10  
- Çanda Kurdî li ----- Reşît Hemo... Sûryê 22

**Wêje:**

- Hêmin Kurdaxî ----- Ebdilmecît Şêxo 26

**Helbest**

- Kurtepişt ----- Awazê Kalo 30  
- Daylan ----- Sêwiyê Welêt 31  
Hêvî û gazin ji demê ----- Nûşîn Bêcirmanî 32

**Çêrok**

- Mêvanê Şemo ----- Merwan Berekat 34  
- Rosê Auslander ----- Tengezarê Marînî 38  
- Dirav ----- Rêberê Silivî 43  
- Zivistan û demên wê ----- Ehmed Îbo 46  
- Qelewbûn, rûdawa buveh ----- M. Elî 47  
- Birûskek ji Mehrecana helbesta Kurdî re 48

**-Hejmar – 43 – 44 - payîz -zivistan - 2008 .**

**- [www.kovarapirs@yahoo.com](mailto:www.kovarapirs@yahoo.com). ----- Buha 50 L.S**

## Pêşgotin

### *Li destpêkê... peyv bû... pîroz bû...*

Rêxistina Navnetewî ya Perwerde, Çand û Zanistiyê (UNESCO) li 17-11-1999an, roja 21ê meha Sibatê wek “roja navnetewî ya fêkirina bi zimanên Zikmakî” bi nav kir.

Gava ku saziyeke mîna Yekîtiya Navnetewan giringiyê dide fêkirina bi zimanê dê û rojeke cîhanî ye taybet jê re vedibjêre, ew pîroziya fêkirina bi zimanê Zikmakî dizane û giringiya ku mirov, nemaze jî zarok, bi zimanê xwe yê dayîkê yê netewî fer bibin dinase û pêwîstiya ku ew zanînen xwe yên destpêkê bi zimanê dayîkê werbigirin dide zanîn. Ew dizane jî ku giringiya wê mijar û babet çî ye û çiqas ji afrandin û peydakirina kesayetiyeke mirov lihev û erênî re pêwîst e.

Lê pirs ev e, piştî deh salan ji biryara xwe, UNESCOyê, wê çî kar di ber ew biryara xwe de kir û kanîbû di ber biryara xwe de bixebitiya? Ra kîjan radeyê derfet di destê wê de hene, ku dewletên mîna yên Kurd di nav sînorên wê de dijîn qayîl bikin, da derfetan bidin mirov û zarokên Kurd daku bi zimanê xwe yê diyîkê, bi zimanê xwe yê netewî, bi awayên rewa û destûrî baxivin û bi zimanê Kurdî di dibistanên dewletê de jî pê fêr bibin.

Lê belê, tevî ku ew biryar UNESCOyê pir dereng hat, bicihanîna armanca wê jî ji beşeke mezin ji gelê kurd re hîn negenaz e û wek xewnê ye, lê bê guman,

bidernghatina wê biryar. ji nehatina wê pir baştir e, biryar û guhdana UNESCOyê bi wê mijarê baweriyê bi paşeroja şaristaniya mirovatîyê bilind dike û hêviyan di dil û hestên hemî lawên milletên ku hîn di bin zordariya nijadperstiyê de ne bilind dike. Pêkanîna ew armanca diyar û giring û paşeroja çavkirê jî, eger dûr e yan nêzîk e, guman li ser nemaye dê bicih were û her zimanekî li ser rûyê zemînê dê derfeta xwe ya rewa û mafdar li ber tava şaristaniya hemdem û nirx û armancên wê yê mirovane bi dest bixe.

Kurd dibêjin “Bila avis be, bila biderengî be”. Birastî jî, biryara UNESCOyê pir derengî hat, lê tevî wê em kanin bi baweriyê bilind bêjin, ku hemî warên jina mirov û mirovatîyê avis bûne, gelek tiştên erênî û hêja di jiyana mirov û gelên bindest de ji dayîk dibin, heyam û asta şaristaniya nûjen pir giran bûye û her rojekê tiştekî nû dizê û dafrîne û qirêja setema bi sedan salan li ber xwe dibe, jiyane paqijtir dike û baweriyên mirov û gelên ji roniya wê bêpar mane bilind dibe.

Desteya Pirs



# ***21ê Sibatê***

## **Roja Navnetewî Ya**

### **Fêrkirina Bi Zimanên Zikmakî**

#### **Mistefa Henan**

**Z**iman ji berhemên herî nirxabilind e di civaka mirovatîyê de. Ew alavek e ji alavên ragihandin û pêkanîna peywendîyan di navbera mirovan de.

Ziman mirovan ji ajelan cuda dike. Di rîya zimên re mirov dikare daxwaz û hestên xwe bide xûyakirin. Ziman di pêvejoya dîrokê de bi me re mezin dibe, pêş dikeve û berfireh dibe. Ango ziman jî wek me zindî ye. Çawa pêdiviyên mirov bi xwarin, vexwarin û lixwekirinê heye, pêdiviya zimanekî jî ji bo miletekî pêwîst e, tiştê ku gelan dike gel ew ziman bi xwe ye.

Ziman hemû nirxên gel yê çandî, civakî, dîrokî, wêjeyî, zanistî...û hwd, di nav xwe de digre. Ew hest, hizir û ramana gel e. Zimanê gelekî çiqas pêşketî be, çiqas rewşenbîr û zaniyarên wî

hebin, ewqas ew gel pêşketîye û cihê xwe di nav civaka mirovatîyê de bilind dibe.

Loma jî, eger gelek li zimanê xwe xwedî dernekeve û lê nepirse, ziman lawaz û nexweş dikeve û li dawiyê winda dibe. Dema ku zimanek winda bibe jî, ew gel bi xwe jî winda dibe û ji holê radibe. Bi hezaran ziman li cîhanê hene, pîrek ji wan bi demê re ji ber bikarnehatina wan winde bûne û ji holê rabûne.

Zimanê me jî yek ji hezaran zimanên komelgeha civaka mirovatîyê ye, ew berî bi hezar salan de heye û ji me re kultûreke dewlemen û pir buha ji goran, helbest, raman, dastan, folklor, çîrok.. û hwd hîştîye. Loma jî divê em li zimanê xwe xwedî derkevin, lê bipirsîn û guh bidinê, pê baxivîn, binivîsin û bixwînin. Divê em di malên xwe de bi

kurdî bipeyivin, zarokên xwe bi çand, kultûr û zimanê zikmakî perwerde bikin û wî ji windebûnê biparêzin.

Li gor rapora Enstîtûya zimanan a ku li Emerîkayê derdikeve, nêzîkî (7000) ziman li ser rûyê cîhanê tên bikaranîn û di her du hefteyan de zimanek ji wan tê windekirin.

Loma jî divê haya me hebe ku zimanê me jî nebe ji wan zimanan. Dijminê gelê kurd bi her awayî şerê me dike, ziman, kultûr û çanda me didize, di riya zagonan re dixwaze bi fermî zimanê me tine bike û ji holê rake.

Ew nahêlin em bi zimanê xwe baxivin, binivîsin û bixwînin, ev yek ne rûyê şaristaniyê û mirovatiyê ye, ew nîşana nijadperestiyê ye, ew neyar millet û zimanê kurdî wek zimanê mirovan napejrînin.

Gotinek heye dibêje:  
**((Miletekî bê ziman weke mirovekî bê dile, çawa ku mirovek nikare bê dil bijî miletek jî nikare bê ziman bijî)).**

Li dewletên demoqrat, ev nijadperestî nayê dîtin, wek numûne: Li dewleta Siwêdê 123 ziman tên bikaranîn û pê tê xwandin, zimanê kurdî jî yek ji wan zimana ye û di nav 10 zimanên mezin de ye. Li sala 1975an perlemanê Siwêdê zagona mafê perwerdeya zimanên zikmakî pejirand, li gor vê zagonê her miletek dikare bi zimanê xwe yê zikmakî baxive, binivîse û bixwîne jî.

Li 17-11-1999an, rêxistina (Ûnêsko) ya çand û zanistiyê, roja 21ê sibatê wek roja navnetewî ya zimanên dayîkê danasîn.

### **Çima roja 21ê Sibatê?**

Di vê rojê de li sala 1952an, polîsan li Bengiladêş 11 kes ji xwepêşandanên ji bo fermîbûna zimanê zikmakî kuştin, loma ev roj bû roja zimanê zikmakî.

Gava ku mirov li zimanê xwe xwedî derdikeve û lê dipirse, ew ziman şiqin dide, mezin dibe û ber jî dide, ziman jî wek darekê ye dar berhemê nade eger tu av nedî,

divê em dara zimanê xwe av din da ku em berê wê bixwin, avdana zimên jî bi xwandin, nivîsandin û bikaranîna wî çê dibe, çinkî hebûna me bi hebûna zimanê me ye.

Resûl Hemzetûf di pirtûka xwe ya bi navê (Daxistan welatê min e) dibêje: **(Eger ez bizanibim zimanê gelê min dê sibe bimire, ezê bixwazim îro bimirim daku mirina zimanê gelê xwe nebînim).**

Ew mirina xwe ji berî mirina zimanê xwe dixwaz e, ji ber ku dema zimanek winde dibe, ew gel bi xwe jî winde dibe. Loma jî, dema ku welatek ji aliyê welatekî din ve tê dagîrkerin, berî her tiştî dagîrker destê xwe davêje zimanê miletê bindest, çand, kultûr û hemû hizrên wî miletî qedexe dike û hewldide da wan ji holê rake, ew kar dike jî da ku zimanê xwe li şûnê belav bike û wan bi çanda xwe hîn û perwerde bike.

Mîkiyafîllî jî di pirtûka xwe ya bi navê (Elpirens- Mîr) de dibêje: **(Eger tu dixwazî miletekî ji holê rakî û winde bikî, divê berî her tiştî tu**

**ziman û çanda wî tune û winde bikî),** loma jî neyarên me bi hemû şêweyan şerê ziman û çanda me dikin, kultûra me didizin, naxwazin em li zimanê xwe xwedî derkevin û pêşve bibin.

Di kovareke Firensî ya bi navê (Le Firenze dane le monde - zimanê Firensî li cîhanê), di hejmar 335an de û di bin navnîşana ((Lîsteya zimanên herî bi bandor û dewlemend li Cîhanê)), weha hatiye: **(Zimanê kurdî li gel hemû qedexekirinê, di nav bi hezaran ziman de, di rêza 31ê de cîh digre, zimanê Tirkî tenê bi (6) pileyan li pêş zimanê kurdî ye, yê Farisî jî li paş zimanê kurdî tê).** Ew vekolîn jî li gor van pîvanan hatiye kirin: Rêjeya axaftinê, bikaranîna wî di amûrên medyayê de û mêjûya danîna berhemên pêşîn.

Gelo: Ev e cihê zimanê me li cîhanê, ma çima emê zimanê xwe kêmtirî zimanên din bibînin, çima em kanin bi zimanên zordarên xwe xweş bixwînin, binivîsînin, û zimanê xwe jî ji bîr bikin. Xem nake û ne jî şerme ku

mirov bi çî û bi çend zimanan baxive û bixwnî, mirov çiqas ziman zanibe ewqas zanînên wî berfireh dibin û zanatir dibin, lê pir şerme ku ew nezanê xwandin û nivîsandina bi zimanê xwe be.

Gotinek Sumeriyan ji du hezar sal de hatiye gotin, dibêje: **Ew çî Sumerî ye ku bi zimanê xwe nizane baxive û binivîse**). Em jî di sedsala 21ê de ne û dibêjin: **Ew çî kurd e ku nizane bi zimanê xwe baxive û bixwîne**. Erê bi hezaran ziman li cîhanê hene lê tim û tim zimanê zikmakî ji hemû zimanan xweştir û ş, rîntir e.

Nemirî Emîn Alî Bedirxan dema ku Osmaniyan ew ji Cizîra Botan surgin Stembûlê kir, ji zarokên xwe re got: **Tirsa min e ku win zimanê xwe ji bîr bikin, yê ku zimanê xwe ji bîr bike ew ne ji min e**.

Ev gotin di sala 1802 an de hatiye kirin, îro jî piştî bêtirî 200 sal, gelek ji me kurdan dest ji zimanê xwe berdane, bi zimanê dagîrkerên welatê xwe dixwînin û dinivîsînin û zimanê xwe jî berdan e.

Her miletek bi pêşketina çand, kultûr, huner û folklorê xwe pêşdikeve, ew bi pîrbûn û pêşketina rewşenbîrên xwe ser bilind dibe, ji ber wê yekê jî, ew kesên ku bi zimanê xwe daxivin, dinivîsînin û dixwînin, jiyane bi zimanê xwe de berdidin û di riya kelepûra gelê xwe re kanin xwe bi cîhanê bidin nasîn.

Di vê derbarê de berêz Celadet Bedirxan di Hawara xwe de weha dibêje: **Zanîn xwenasîn e, herkesê ku xwe nas dike, dikare xwe bide naskirin**). Divê berî her tiştî em xwe û çanda xwe binasin û bidin naskirin, em destên xwe bidin hev û tiştêkî ji gelê xwe re pêşkêşkin, ji ber ku yekîtiya me yekîtiya welatê me bi xwe ye.

Dema ku Xanim Rewşen Bedirxan li ser doşeka mirinê bû, ji lawên gelê kurd re weha digot: **(kurê min, dema em hebûn hûn neghîştî bûn, îro hûn gihîştî ne, lê mixabin em nema ne, kurê min ji hev hez bikin û piştgiriya hev bikin, yek bin, ji hev belav nebin**.

Di radyoya Siwêdî de li roja (21)ê sibatê bi boneya roja zimanê zikmakî weha hat weşand: **(Eger mirov amade be ku ji bo zimanê xwe bemire, gerek e mirov girîngiya parastina zimanê zindî tê bighê).**

Kurd jî îro divê ji bo azadiya zimanê xwe bi her tiştî xwe bidin pêş, bila yek ji me nebêje: Ezê bi tenê çî bikim, yan jî ezê pêş kim, na! em tev bi hev re dikarin her tiştî bikin, em dikarin jiyanê bi zimanê xwe de berdin û wî bi pêşxînin, ji ber ku paşeroja me, mandin û hebûna me bi parastina ziman û çanda me ve girêdayî ye.

Celadet Bedirxan di hejmara (9)an de ji kovara Hawarê dibêje: **Yekîtiya milletê kurd bi yekîtiya zimanê kurdî tête pê.** Wek nimûne: Dema ku baran dibare ew dilop dilop dibare, ew dilop jî bi hev re lehî û çeman çê dikin, ew jî dighên hev Deryayên mezin çê dikin, em jî dema ku destên xwe bidin hev, emê zimanê xwe pêş bixînin û bighînin asta zimanên pêşketî û dewlemend. Divê em bi demê

re bin, xwe li paş pêvejoya dîrokê nehêlin, dîrok bi lez diçe.

Roja îro peyvên nû derdikevin holê, divê em wan peyvan di ferhenga xwe de bi kar bînin, zimanê xwe di warê zanistî, ramiyarî rêzanî, civakî û hwd de dewlemend bikin û bi pêşxînin.

Divê Dê û Bavên me, rewşenbîr û xwandevanên me, guhê xwe bidin zimanê xwe û baweriya wan bi paşeroja kurdeweriyê hebe. Divê em li gor vê baweriyê zarokên xwe pewerde bikin û evîna zimanê xwe di hest û mejiyê wan de biçînin, daku meraqa zarokên me li ser zimanê kurdî bilind û berz bibe. Dê û Bav ji zarokan re wek nimûne têne pejirandin, eger Dê, Bav û derdora wan sist be û ne kurdperwer be, zarok jî wê sist bibin û nexwazin hîna zimanê kurdî bibin û pê bixwînin.

Di vî derbarî de kesên ku xwe zimanhez dibînin û xemxwarê mafê gelê xwe ne, ji wan tê xwastin ku xwe ji civakê bidûr nexin, xwe berdin nav civaka gelê xwe û



hesta hezkirina zimên di nav wan de biçînin.

Divê rewşenbîrên kurd di nav xwe de peywendiyên çandî, bi kar bînin û xembarên pirsra zimanê xwe bin, dîroka gelê xwe bixwînin û bidin xwandin, zimanê xwe ji wendebûnê biparêzin û pêşde bidin, ev dem dema xwenaskirina gelan e, her miletek dixwaze cihê xwe tê de bistîne, nemaze piştî derketina têknolojiya nûh û berfireh, wê teknolojiyê cîhan kiriye gundekî biçûk, mirov dikare zû zû û di demeke kurt de xwe bighîne hemû aliyên cîhanê, wan nas bike û xwe bi wan bide naskirin. Nema wek

berê mafê mirovan di tariyê de û bi dizî werin binpêkirin.

Îro ne wek diho ye ku jêderên hînkirin û xwandinê kêr in, yan jî tinene. Îro bi sedan, kovar, rojname, pirtûk û alavên ragîhandinê hene, merov dikare di riya wan re, sudê bigre û hînê her tiştêkî bibe.

Li dawiyê divê em gotina helbestvanê me yê nemir Cegerxwîn herdem wînin bîra xwe:

**Xwandin nebe kes naçe pêş  
Peyda dibin pir derd û êş  
Ev tac û şewket xwandine  
Ev serbilindî xwandine.**

---

**Efrîn 15/7/2620k - 2008 z**

---

Σ



β



Ω

# *Zeredest*

## **Pêxemberê Yekirina Xwedê**

*Erê Zeredestî bi rêwresmên xwe di nav Kurdan de nemaye, lê hin baweriyê wê hîn di jiyana mirovê Kurd û civata wî de tên dîtin. Ji wê bêtir, gelek olbawerên Êzdî hene dibêjin em Zeredestî ne. Ji ber wê jî, me sûdar dît ku em bi kurtî baweriyên bingehîn ên ola Zeredestiyê xuyan bikin.*

**Amadekar: Rozad Elî**

**P**iraniya jêderên dîrokî dibêjin, ku Zeredest di sedsala şeşan de ji berî zayînê, li herêma Medya ku di navbera deryaya Xezerê û çemê Dicle de bû, jiyaye.

Di kultûra Zeredestiyê de hatiye gotin, ku roja jidayîkbûna wî bêmînak bû. Di wê rojê de, sirûşt tevde şabû, Iblîs jî revî û xwe veşart, lê wî peyayên xwe şandin da ku zarokê nûhatî bikoujin. Lê gava ku ew nêzîk dergûşa wî bûn, nûbûyê şîrmij deng kir, lavek ji Xwedê re got û pê peyayên Iblîs birevandin dan.

Gava ku Zeredest piçekî mezin bû, dîsa Iblîs xwest wî ji rê bike, vêre biryar kir, ku eger ew "peyama xwe ya Pêxembertiyê" berde, dê hukmê tevahiya gerdûnê têxe destê wî, lê Zeredest razî nebû û Iblîs qewitand.

Zeredest di xortaniya xwe de cihê baweriya xelkê bû û ji sinciyên baş re mînak bû. Pişt re, derbas nav olperestan (kahin) bû û bû bawermendekî olmendar ji olên "Hindo Ewropî" yê Xwedênas. Wê hingê, ew di nav hevalên xwe de bi zanîn û zanebûna olî dihat nasîn. Lê belê pir

neçû, ew ji wan veqetiya û guhertineke olî ye gewre di olbaweriyên Êranê û hemî mirovatîyê de çê kir.

Rojekê Zerdeşt daketibû nav avekê, da ku avê ji hevrêyên xwe re wîne. Gava ku wî kunê avê dagirt û kir ji avê biderkeve, jîndarekî ji roniyê li ber kendalê çem diyar bû. Zerdeşt jê tirsî, lê belê jîndar vêre peyivî, ew hêmin kir, xwe danasîn û got, ku ew “Fohomana” ye, yek ji şeş teşeyên giyanî yên ku li dora Xwedêyê bitekûtenê “Ehoramezde” ne.

Wî Firişteyî bi destê Zerdeşt girt, bir ezmên û di nav destên Ehoramezde û teşeyên giyanî “Emîşe Spênte” de danî. Wê gavê, Zerdeşt peyama pêxembertiyê ji Xwedê wergirt û jê hat xwastin, ku miletê xwe û hemî mirovan li ser rûyê zemînê pê agahdar bike. Gava ku Zerdeşt fermana pêxembertiyê wergirt, ew di sî saliya xwe de bû.

Piştî ku Zerdeşt ji ezmên vegeerî, wî doza peyama Xwedê kir. Lê gel jê bi guman bû û bi tirs li doza wî nihêrî, nemaze gava ku wî ew bi êşkenceya dinyadin gef dikirin û digot, ku her mirovek kane nemirî bibe, netenê mirovên zengîn.

Piştî deh salan ji dozkariyê, û gava ku Zerdeşt ji gelê xwe bêhêvî bû, wî barkir çû welatê Xuwarizmê. Li wir Qiralê Xuwarizmê bixêrhatina wî kir û wî û jina xwe bi ola Zerdeşt bawer kirin û bi wê yekê rê li ber Zerdeşt vebû, ola wî belav bû û tede bi ser ket.

Zerdeştiya resen di rêwresmên xwe de, pir sivik û hêsan bû. Li destpêkê, gerek mirov zanînên olî nas bikirana û têgbihişt, paşê jî ev lava bigota: “Ez diyar dikim ku Ehoramezde pîroz dikim, bi Zerdeşt bawer dikim, Iblîs tune dikim, her şeş Emîşe Spênte rêz dikim û çêxwaziyê li ba

Ehoramezde dibînim". Bi vê laveyê mirov ola xwe ya berê berdida û dibû bawermendê Zeredeştiyê.

- Bingeha baweriya Zeredeştiyê:

Hîmê Zerdeştiyê yê bingehîn yekbûna Xwedê ye. Ew cara yekê bû di dîroka mirovtiyê de dihat gotin, ku: Xwedê yek e, ew Ehoramezde ye, î tekûbeitenê ye, wî her tiştên çê û baş afirandiye û ji şerxwaziyê ne raziye, ji ber wê jî ew ji destpêkê de li dijî şer rawestiye, li dawiyê jî dê çêxwazî û rastî biserkevin, şerxwazî dê bişkê, Iblîs û karên wî jî dê bicarekê têk biçin.

- Afirandina civata giyanî/Firîşte:

Li destpêkê, ji Xwedê Ahoramezde pêve tişteke tune bû. Pişt re wî cêwiyek giyan afirand û her du azad berdan, yek "Spêntemayno" û yê din "Angiramayno" bû, û Xwedê ew ji bo vebjartina delameta sinciyane jî azad kirin.

Spêntemayno sinciya çêxwaziyê vebjart û bi "Giyanê Pîroz" bi nav bû. Angiramayno jî sinciya şerxwaziyê vebjart û bi "Giyanê Xinan" (xebîs) bi nav bû. Û ji ber ku ew vebjartineke azad bû, pêgerek bû ku her yek ji vebjartina xwe re dilsoz û pêbend be. Loma jî, sê baweriyên Zeredeştiyê yên bingehîn hene: Azadî, vebjartina azad û dilsozî ji herdu bingehên destpêkê re. Li gor wê yekê, bingeha birêveçûna heyînê di Zeredeştiyê de, çî ji şênîyê zemînê û çî ji yê ezmên re, li ser pêkanîna wan her sê hêman û baweriyên radibe.

Piştî ku wan her du teşeyan rêkên li dijberî hev vebjartin, pevçûna dijwar û demdirêj di nav wan de dest pê kir. Digel ku Xwedê ji destpêkê de kanî Angiramayno tune bikira, lê wî biryara xwe standibû, gereke ew jî ji zagona azadiyê, ya ku ji hemî afrandeyên xwe re danî bû, pêbend û dilsoz be.

Û ji bo ku ew zagona “vebjartina azad” bicih wîne, Xwedê bi dilê xwe bi aliyê Spêntemayno girt. Û da ku hêza xwe ji pevçûnê re xort bike, wî bi beşdariya “giyanên pîroz”, şeş teşeyên ji roniyê, wekî ku çawa mûmekê ji mûmekê vêxe, ji giyanê xwe afirandin û nav li wan kir “Amîşaspênta”, yanê “nemirên pîroz”, ew teşe ev bûn: Fohoyama (ramana çê), Aşa vahêsta (rastiya beloq), Kişatar Vêra (firîşteyê paşrojê), Spênta Armatî (dilsozî), Horvat (sergihayî), Êrmîtî (nemirin).

Wan her şeş pêriyan, alîkariya Xwedê di afrandina gerdûnê de kirin û di navbera Xwedê û hemî afrandeyên wî de bûn navbêncî.

Piştî wê, Emîşespênta jî çend jîndarên pîroz afirandin û bi navê “Ahora” hatin nasîn, Ehoramezde ew jî di warê pevçûna bi şerxawziyê re ustubarkirin.

Li hember wê, Angramayno jî çend teşeyên giyanî, ku berê bi rû bûn û bi (Dêva) bi nav dibûn, hişyar kirin, xopandin û kirin ku li kêleka Angramayno, li dijî her karekî qenc ku ji Xwedê tê bisekinin.

Bi vê hawî, her du civat: Firîşteyî û Xinanî, berî jiyana şênberî (madî) hatin afrandin.

Di ser vê jiyana du nîkî ya şerdar re, Ahoramezde bi gewretiya xwe ya payebilind, di ser her tiştê re radiwestî. Lê belê wî di pevçûna dergûşkî de, piştî hêzên çêxwaziyê digirt.

Lê belê Ahoramezde dizanî, ku şikandina şerxwaziyê û alîgirên wê, dê bê afrandina jiyaneke şênberî (madî) ya ku mirov navnîşana wê ye, ne gengaz be. Wî didît ku jiyana şênberî dê bibe meydana lêhatî ji pevçûna di navbera serbazên rastiyê û xinaniyê de. Xwedê dizanî jî, ku

Angramayno dê bi hemî hêza xwe, hêriş rindî û qencyê bike, lê belê ewê li dawiyê, di keftelefa şerê dijwar û berdewam de, biweste, were tunekirin, rola mirov jî dê di wê serkeftinê de pir giran be.

- Afirandina gerdûnê:

Xwedê gerdûn bi du qonaqan çê kir:

1. Li destpêkê, Xwedê rewşeke şênberî ye hevîrkî (cêlî, hûlamî) ye bê reng û şêwe bi navê "Mênog" afirand.

2. Piştî ku Xwedê giyan bi tiştan de berda rewşa şênberî ya bi reng û şêwe peyda bû, navê wê rewşê jî "Gêting" bû. Gêting bi şeş pêngavên demkî hate çêkirin. Li destpêkê, Xwedê ezman jî zinarekî kirîstalî çê kir, paşê jî li pê hev ev tişt çê kirin: Av, zemîn, keskahî, jîndar û li taliyê jî mirovê yekê çê kir.

Piştî ku Ehoramezde afirandina gerdûnê kuta kir, Engrameyno xwe avête nav û dûzana wê ji hev xist. Wî

stêrk li ezmên belav kirin, ava deryayê şor kir, nerindî li cîhanê belav kir û tovên şer û kavliyê di gerdûnê de çandin. Pişt re, ew ket mejiyê mirov jî û sinciyên her nebaş tê de çandin.

Wê hîngê, Emîşespênte rabûn li hember wî sekinîn û tiştên ku Engrameyno û alîgirên wî wêran dikirin, durust dikirin. Û herwiha, pevçûn di navbera her du aliyan de ranaweste. Û digel ku çêxwazî dê li taliyê bi ser keve, lê belê Firîştayên Emîşespênte, wekî ku teşeyên çêxwaziyê ne, dê bê alîkariya mirov bi ser nekevin.

Ji ber wê jî, ji mirov têxastin, ku erkên xwe yên sinciyane nas bike, bi ramana xwe, gotina xwe û bi karê xwe yê qenc, piştî hêzên çêxwaziyê bigre, da ku pevçûna gerdûnî ya çêxwaziyê biserkeve û dîrok biçê asta xwe ya dawîn. Li wê demê dê heyîna şênberî û giyanî ji şer û ji xinaniyê pak bibin.

- Pêngavên dîrokê û derketina "Rizgar":

Ehoramezde dizane ku dawiya şerxwaziyê dê were, loma jî wî pîlaneke ji sê pêngavan danî, her pêngavek jî serdemeke demê destnîşan dike:

1. Pêngava yekê (pêngava afirandina bêkêmanî): Ehoramezde gerdûn bi ciwantirîn û sergihatirîn şêwe afirand, ew demekê dirêj wilo ma û Iblîs jî di wê demê de razayî bû.

2. Pêngava diduyan (pêngava têkilheviyê): Iblîs hêriş bir ser afrandeyên Xwedê, jehra xwe berdayê û çêrxwazî û şerxwazî tevlehev kirin.

3. Pêngava sisiyan: Ew bi cudakirina çêrxwaziyê ji şerxwaziyê dest pê dibe û bi têkçûna Iblîs bidawî dibe. Wê hingê guerdûn dê vegere rengê xwe yê ciwan û bêkêmanî, dîrok jî dê bigihê dawiya xwe û demeke herdemî ye bê nakokî û dijberî dê dest pê bibe. Di wê demê de,

nexweşî, êşek, xeydîn û mirin namîne.

Pêngava sisiyan bi hatina Zeredeşt dest pê dibe û bi hatina Rizgar ((Şawşinyat yan Şoşanz – Mesîhê Bendewar)) digihê dawiya xwe, ji ber ku Şoşanz dê şerê talîyê di navbera hêzên çêrxwazî û hêzên reşantiyê de bajo.

Rizgar bi xwe jî dê ji keçeke keçîn bibe, gava ew keç xwe di gola ((kana sava)) de dişo, bi ducanan dibe, çinkî tova Zeredeşt ya ku ji hêla Firîşteyan de di golê de hatibûn hilanîn, derbas malçûka wê dibe û wê avis dike. Yanê Rizgar ji piştta Zeredeşt tê. Digel ku Rizgar bi ew şêweyê awarte dibe û tê cîhanê, lê ew jî dê û bavekî mirovî ye, ev yek jî diyar dike, ku rizgariya gerdûnê ji şerxwaziyê, ji ustubariya mirov e, ewê wê keftleftê bajo serî û dê li her devereke bide pê serbazên reşantiyê û wan ji rûyê zemînê bimale.

- Çawatiya Dinyadin

Piştî ku mirin derbas jiyana mirov bû, bawerî bi vijînê, hesêb û jiyana diduyan (dinyadin) bû. Mirov bawer kir, ku mirin guhertineke, jîndar pê ji rewşa "Gêting" ya şênberî diçin ya giyanî ya zelal "Mînog".

Piştî ku giyan ji govde derdikeve, ta dema ku govde ji binê zemînê rabe di berbeqa Mînog de li benda roja qiyametê dimîne, wê hîngê dîsa ew her du bi hev re bibin yek.

Sirûdên Gata yên ku li ser zimanê Zeredeşt li derbarî giyan hatine gotin, wiha dibêjin:

Piştî ku giyan govde berdide, li ber "Mîsra" serokê dadmendên dinyadin radiweste. Mîsra li karên ku wî di jiyana xwe de ji ber mirovatî û çêxwaziya gerdûnê ve kirine, dipirse. Her du alîkarên Mîsra, Sirwaşa li aliyê rastê û Raşno li aliyê çepê disekin û karên mirî bi mêzîna hesêb dipîvin. Qencyên wî dixin aliyekî û

xirabiyên dixin aliyê din, eger kêla xêran giran bû, ew diçe bihuştê û eger ya xirapiyan dagerî, ew diçe dogehê. Wê hîngê, qurban, rêwresm û laveyên wî sûtê lê nakin, tenê raman, gotin û karên wî yên qenc tên hesêb.

Piştî wê, giyan diçe ser "Pira Sîratê". Ew pire li pêş giyanê mirovê çêxwaz fereh dibe û bi hêdîka berve deriyê bihuştê diçe. Lê ew pira li ber giyanê pîs teng dibe û di nav agirê dogehê wer dibe. Lê giyanê ku rindî û pîsitiyên xwe biqaserî hev bin, pirê derbas dike û diçe li cihekî di navbera bihuşt û dogehê de mîna remtelekî bê hest dimîne.

Gava ku Rizgar Şawşînyat dertê, roja dawîn nêzîk dibe. Zemîn hestiyên miriyên ku ji pêvajoya dîrokê de di bin xakê de veşartîbûn, hildide. Dogeh û bihuşt jî ji mirovan vala dibe û hemî tîrên roja hêşra gewre. Li wir kesên ku ji hezar salan de mirine û yên



ku hîn dijîn, hev du dibînin  
û hemî tèn hesabê dawîn.

Di wê rojê de, Firîşte êgir berdidin zemînê, çiya dihelin, çemekî ji ronaveke agirî çê dibe, divê herkesek tere derbas be. Kesên çêxwaz, wekî ku çawa di çemekî ji şîrê sarûgermî re dimeşin wî derbas dikin. Yên şerxwaz jî, li ber lehiya êgir diçin û ji rûyê zemînê winda dibin. Li wê çaxê, serbazên reşantiyê yekcar têk diçin û bi lehiya çemê êgir re diçin kûrahiya dojhê, cihê ku Engramayno û yên pêre revîbûnê. Û herwiha yekcar dawî li şerxwaziyê tê.

Piştî wê, dojhê jî mîna hemî gerdûnê, xwe pak dike û dibe herêmek ji zemîna şehreza. Ew kesên ku çemê êgir derbas kiribûn jî, li ser zemîneke pak û li bin ezmanekî nû dijîn, ew zemîn û ezman yên berê bixwe ne, lê mîna destpêka afrandina xwe pak û zelal bûne.

Piştî wê, Ehoramezde radibe ava nemiriyê dide

wan hemiyan, û ew di bihuşta ku firehiya xwe qaserî erdê û ezmana ye, nemirî dibin. Her qunceke ji bihuştê jî, di buhareke herdemî de dimîne û ji her rengên dar, ber û gul tede şîn dibin.

- Sincî, lave û erkên sinciyane:

Li gor baweriya Zeredestiyê, mirov û Teşeyên Pîroz (Firîşte) ji hêla erkên dijîtiya şerxwaziyê ve mîna hev in. Loma jî, gereke mirov li birayê xwe yê mirov û li hemî afrandeyên Xwedê miqate be, li giyan û govdeyê xwe miqate be. Lêmiqatebûna govde jî bi paqijî, xwarin û vexwarina sivik û bi hevsengiya (tewazin) di her tişt û karekî de tê kirin. Lêmiqatebûna giyanî jî bi pêkanîna sîstema sinciyan ya rast a ku Zeredest daniye pêk tê. Ew erk jî bi sê hêmanan tê naskirin:

1. Ramana baş: Gereke mirov bi ramanên baş mijûl

bibe û yên pîs ji xwe bi dûr bixe.

2. Gotina baş: Gereke gotinên baş ji devê mirov derkevin.

3. Karê baş: Gerek e mirov herdem karê baş ji bo mal û civata xwe bike û hiç ziyane negihîne jîndarên din.

Û ji ber ku mirov hêjatrîn afrendeyê Xwedê ye, gereke hiş û zanebûna ku Xwedê dayê, têxe xizmeta rindkirina gerdûnê, da ku bigihê asta xwe ya pak û gewre, ya ku dê li dawiya demê bigihê. Çinkî mirov di nav hemî afrendeyên Xwedê de motik e, wê lomê jî, ustubariya wî ye ku afrandeyên Xwedê ji bindestiya Iblîs rizgar bike.

• Rêwresim û lave:

Di dema Zeredeşt de, Zeredeştî oleke sade û hêsan bû, tenê çend rêwresmên wê yên olî hebûn. Lê bi demê re, bawermendan gelek tiştên têvel û têkilhev lê zêde kirin.

Zeredeşt pênc çax nimêj ferz kirin, berbangî, nîvro, îkîndî, rojava û nîvşev. Giringiya nimêja Nîvro û Nîvşev taybet bû, ji ber ku li nîvro, hêzên ronahiyê di bilintirîn hêza xwe de ne, mîna dema ku Xwedê gerdûn nuh çê kiribû. Li Nîvê şevê jî, hêzên reşantiyê di bilintirîn çalakiyên xwe de ne, ji ber wê jî, ji bo piştgiriya hêzên ronahiyê, bawermend êgir dadidin û nimêj dikan.

Berî nimêjê, bawermend avdaz dike, dest, rû û lingên xwe dişo, radibe li nav destên Ehoramezde disekine, destê xwe bi xwe de berdide û laveyên nimêjê dibêje. Di dema nimêjê de, gereke çavên wî li êgir bin. Ew li dema nimêjê, piştî xwe vedike, bi her destan digre, paşê jî wê sê caran li nava xwe dalîne û li pêş û paş girêdike, ew bi wê yekê, destnîşana hersê sinciyên Zeredeştîyê yên ku me li jor gotibûn, dike.

Di ola Zeredeşt ya resen de, pîrozgeh, pût û cihên şerjêkirina qurbanan tune bûn, ji ber ku Xwedê li her derekê ye, Xwedêyê ku zemîn û ezman têrê nake, di maleke ku bi destê mirov hatiye çêkirin de rûnane. Ji ber wê jî, nimêj li her dereke pak ku ûcaqê êgir lê hebe, gengaz bû.

- Rêwresmên mirinê:

Govdeyên jîndarên zindî ji gerdûna Ehoramezde ne, pak in, lê dema ku dimrin, laşên wan dikevin gerdûna Engirameyno û dibin tiştine pîs û pintî. Ji ber wê jî, û ji bo ku zemîn qirêj nebe, Zeredeştiyan laşê miriyan danetanîn ser xakê, ew li cihekê bêkes li ser tehtekê datanîn ta goştê wî dirizî yan balindeyan dixwar, pişt re û da ku kanibe li roja vejînê ji nû ve rabe, ew hestû binax dikirin.

- Rêbazên pakbûnê:

Di Zeredeştiyê de, kufîk, gemrandin û qirêjî ji karên Engiramayno ne, wê ûştê

Zeredeştî ji hemî miletan bêtir pakiya govde, kinc û xwarina xwe diparêzin. Li ba Zerdeştiyan, pakbûn di asta nimêjê û karê qenc de ye. Ji ber ku mirov bi pakbûnê tevlê Xwedê dibe û li dijî hêzên Iblîs şer dike. Herwiha mirov kane bi karûbarên pakbûnê yê rojane şerê şerxwaziyê bike.

- Kurtahiya rola Zeredeştiyê:

Ola Zerdeştî li rojhilat û li rojava belav bû. Olbaweriyên wê ketin nav hemî olên ku li dû wê hatin. Hin ji wan baweriyên ra niha hikariya xwe li jiyana giyanî ya mirovatiyê dikin. Yê Giringtirîn jî jê ev in:

1. Bingeha sinciyane ji heyînê re:

Xwedêyê jorîn Xwedêyekî sincîdar e. Pêwendiya di navbera wî û mirov de, li rada yekê, sincîvanî ye. Rêwresm û şeweyên perestvaniyê ne ji ber koletiya mirov ji

Xwedê re ne, bi karên perestvaniyê bor (nefs) ji nerindiyan pak dibe û dijîtiya pîsîtiyê re xort dibe.

Di Zeredeştiyê de, bingeha sincîvaniyê, ji tevahiya afrandeyan re bingeheke serekî û cewherî ye. Yanê, hebûna gerdûn li ser wate û bi mebesteke sincîvanî ye, ji ber ku ji destpêka afrandina wê de, heyîne şêwe û salixeke sincîvanî standiye.

2. Hevkariya Xwedê û mirov:

Di olên Rojhilatî yên kevnare de, armanca mirov ya dawîn ew bû, ku mirov daxwazên Xwedêyan nas bike û di jiyaneke bê wate û bê armanca de û di demeke bêdawî de bi Xwedê re bibe yek. Lê belê, di Zeredeştiyê de, mirov di projeya gerdûnî ya li dijî Iblîs de û ji bo veğerandina pakî û zelaliya gerdûnê ya destpêkê, dibe hevparê Xwedê. Ê wilo, berpirsiyariya guhertin û nûjenkirina gerdûnê, li rada

yekê dikeve ser milê mirov.

3. Yekirina Xwedê:

Zeredeşt kesê yekê bû ku têgihîştineke zelal li derbarê yekbûna Xwedê danî û ew bi rêbazek tekûz û hevgirtî darijt.

4. Bingeha şerxwaziyê û ramana Iblîs:

Zeredeşt şerxwazî di kesayetiyeke giyanî ye gewre de bicih kir. Bi wê yekê, wî yekemîn şirovekirin ji hebûna şerxawziyê re li gerdûnê, ku bi hêsanî tê pejrandin, danî. Lê belê digel hemî hêza Iblîs, ew şerxwazî ne herdemî û ne jî nemirdî ye û dê li dawiyê têk biçe.

Yanê baweriya Zeredeştiyê ji gerdûnê re dunikî ye, **çêxwazî** û **şerxazî**, lê belê cewherê gerdûnê yekirin e, yanê ew bi destê Xwedêyekî û bi şêwekî pak û çêxawz hatiye afrandin.

5. Azadiya mirov:

Taybetiya bingehîn a ku agahiyê (وعی) ji şênberiya bêgiyan (Madî) cuda dike, azadî ye. Ji ber ku agahiya bê azadî, şeweyek e ji şeweyên bêgiyantiyê. Di Zeredeştiyê de, mirov di jiyana xwe de azad e, ne dibin ti zordariyê de ye. Lê belê, ew azadî, mirov dixê bin berpirsariyê, bi berpirsariyê re jî hesab tê meydanê, çinkî her berpirsariyek hesabek e, gava ku berpirsariyê tinebe hesab jî netê kirin.

## 6. Mebesta mirovatîyê:

Cara yekê bû ku di dîroka mirovatîyê de, têgihîştineke diyar ji mirovatîyê re di Zeredeştiyê de hat dîtin. Zeredeştiyê diyar kir, ku mirovatî ne tenê komê mirov e û her kes bi çarenûsa xwe mijûl dibe, wê da zanîn ku bi mirovan civateke yekgirtî çê dibe û hemî mirov roleke bi hev re di tevgera dîrokê û mebesta wê de dilîzin.

**\*-Jêder:** Fîras Elsewâh: Rehman û Şêtan ji belavokên weşangeha Eladîn, çapa sisiyan 2004, û jêderine din.

---

# Çanda Kurdî li Sûryê

-- Reşît Hemo --

Her çawa em dizanin ku her sê herêmên Kurdî li Sûryayê (Cizîr, Kobanî û Çiyayê Kurmênc) li sala 1921an ketin nav sînorên Sûryayê. Miletê Kurd jî wê hîngê bi tevahî di kela xebata serxwebûnê de bû. Li Tirkiyê şerê destlata Tirkiyê dikirin, li Îraqê şerê Înglîzan dikirin û li Sûryê jî şerê Firensiyên dikirin. Haya wan jî çand û zanebûnê tunebû.

Ji xwe Kurdên wan her sê herêman di warê civakî û zanyariyê de jî li şûn bûn, rêjîma civakî hîn Eşîretî bû, axatî derebegîtî hîna xort bûn, dibistan li bajar û gundên Kurdan tune bûn, xelkê bi zimanê Tirkî û



tîpên Erebî dixwandin. Piraniya wan jî ne xwende bûn, xwendina hebû jî olperestî bû. Li her çend gundan meleyek hebû, feqe lê dicivîn û xwendina olperestî dixwendin. Bi tevahî zanyarên millet li demê ew bûn.

Lê divê em bêjin, eger li wan deman xwendin û zanistî ya nivîsandinî tunebû, lê toreya Kurdî ya ser dev û lêvan dewlemend bû, çî çîrok çî stran çî medhelok, ew bi awakî fereh di nav millet de hebûn, wek nim/ne, her Kurdek, çî jin çî mêr, dengbêj bû, li şevên zivistanê dengbêjan li odên axan û mixtaran şev

şên dikirin, çêrokbêjan jî çêrokên efsaneyî digotin. Herweha çandeya millet bi vî awayî bû.

Li sala 1925an şoreşa Kurdî ya ku bi navê (şoreşa Şêx Se'îd) hatiye binavkirin rabû. Û piştî têkçûna şoreşê, gelek Kurdên me yê binav û deng ji ber zilma Tirkan bazdan hatin Sûryayê, yek ji wan Celadet Bedirxan bû.

Celadet Bedirxan berî bê Sûryê ketibû nav şoreşa Şêx Se'îd, piştî şoreş têk çû ew çû Misirê nik bavê xwe, lê gava ku bavê wî li sala 1926an çû ser heqiya xwe, ew hat Beyrûdê nik apê xwe Xelîl Ramî. Li wir ew fikirî ku car din şoreşeke mezin li Tirkîyê rake. Loma jî li sala 1927an, li bajarê Bihemdûnê civata "Xûybûnê" çêkir û gelek axa û serekên Kurdan lê hazir bûn. Qirara wan a pêşîn ew bû ku hemî civatên Kurdî yê berê rawestî. Biryara dudiyar ew bû ku hemî axa û

serekên Kurdan tevkarîyê bikin ku şoreşeke mezin li Tirkîyê çê bikin. Hîngê şoreşa Çiyayê Araratê li dar bû, loma jî di civînê de "Îhsan Nûrî Paşa" wek serokê wê şoreşê binav kirin.

Biryarên Xuybûnê ya pêşîn ew bû, ku Kurd bi şoreşekê li başûrê Kurdistanê (Mardîn, Amed, Urfe û Midyat) rabin da ku giraniya şer li ser şoreşa Araratê kêmbikin. Lê xuya bû ku axa û serek eşîrên Kurdên Sûryê ew biryar bicih nanîn. Lê Celadet ket nav şoreşê, lê belê ew şoreş têk çû û Celadet jî di riya êranê re veqetîya Sûryayê.

Li vir sê tiştan tesîra xwe li ser Celadet Begê hîştin: Yek jê şikandina şoreşekê li pê yekê. Ya diduyan bêtifaqîya axa û serokeşîrên Sûryayê. Ya sisiyan, navbera Tirkan û Ferensîyan xweş bû wê jî tesîra xwe li tevgera Kurdî dikir. Ji ber van hersê tiştan, Celadet Beg bê hêvî

dibû û berê xebata xwe diguhert û bi ser belavkirina çand û zanyariya Kurdî diçû. Wî didît ku bê destxistina çand û zanistiyê ne mimkune şoreşa Kurdî biçe serî.

Çand û zanistiya ku Celadet dest pê kir ku belav bike, tişteki nuh bû, wek inqîlabekê bû di çanda Kurdî de. Her wekî me got, berê Kurdan nivîsarên xwe bi tîpên Erebi dinivîsîn, lê vê carê Celadet dest pê kir ku wan bi tîpên Latîni binivîse. Elfabeya xwe ya bi tîpên Latîni hîn ji sala 1919an de amade dikir, lê wî li sala 1932an dest biderxistina kovarekê bi navê "Hawarê" bi tîpên Latîni kir.

Birastî, ew karekî pir zehmet bû, ji ber ku ew ji wî bi xwe re jî karekî nuh bû, divyabû ew her û her tê de bixebite û nivîsarên nivîskaran serast bike.

Ji aliyê din de, xelk hînî van tîpan ne bibûn û bi zehmetî kovar dixwendin û

jê re dinivîsandin. Lê her çawa be, xelkê bi eşq û bi can xwe li dora kovarê da hev. Helbestvan û torevanên Kurd wek: Osman Sebrî, Cegerxwîn, Qedrî Can, Nûridîn Zaza û yê din jî li dora wî dicivîn.

Celadet Beg tevî hevalên xwe bi şev û rojê di kovarê de dixebitîn û ew pêşve didan, gotar û nivîsar ji her alî de jê re dihatin, ra ji Êraqê jê re dinivîsîn, û herwiha kovar bi awakî fereh di nav millet de belav bû, lê mixabin ji ber ku kovar bi tîpên Latîni bû piraniya xelkê nikarîn ew bixwendana, tenê ew dibirin li cem xwe dihîştin. Lê her çawa be, çanda Kurdî li ser bingehe sazûmanke nuh rê vekir û belav bû, û bi dehan nivîskarên Kurd rahiştin xame û dest bi nivîsandinê kirin.

Kovara Hawarê heya sala 1943an dom kir. Pîncî û heft hejmar jê derketin û pişt re sekinî. Lê kovara bi



navê “Ronahî” li dewsê derket. Ew jî wek Hawarê bi ferehî di nav millet de belav bû.

Her bi vî awayî, kovara Hawarê ji destpêka sala 1932an de û li ser bingeha Elfabeya Latîni û bi rengê nuh rê qelaşt û pêde çû. Fikir û ramanên milî di nav millet de belav bûn û bi dehan nivîskar û ronakbîrên Kurd derketin qada nivîsandinê. Lê sed mixabin ku ev kovara “Ronahî” jî ji ber sedemên destengiya diravî tenê 28 hejmar jê derketin û sekinî.

Di nav vê têkoşîna xame û ramanan de, gelek kitêbên giranbiha jî bi zimanê Kurdî ronî dîtin û li nav millet belav bûn. Gelek ji wan bi destê Celadet bi xwe hatibûn nivîsandin. Piraniya wan kitêban li dor Elfabe û rêzimana Kurdî digerîn. Kamîran Bedirxan jî çend kitêb nivîsandin û çap kirin. Cegerxwîn jî dîwana xwe ya pêşîn di sala 1945an de çap kir. Osman

Sebrî jî kitêbên “Bahoz” û “Derdên me” çap kirin û kitêbxana Kurdî bi afrandinên xwe dixemiland. Û bi vî awayî, çanda Kurdî bi gavine fereh pêşve diçû û gulvedida.

Bi rastî ew xebat di warê çand û zanyariyê de şoreşeke mezin bû ku Celadet Bedirxan û hevalên wî pê rabûn.

---

### **Hopka- Destpêka sala 2009an**

***Hêmen Kurdaxî***  
di berhema xwe ya sisiyan de:

*“Fz bişewitim..  
Dumanê min jî wê ji te hez bike”  
dara zeytonê ye*

**Dr. Ebdilmecît Şêxo**

**G**ava min çel helbestên Hêmen Kurdaxî, tenê wek mînak; “Reva hespekî tî .....”, “Cûdî dişewite...”, “ji devê berbangê”...“dara te pelên xwe avêtin”, “Emê çawa bikin?” xwendin, bê vîna min, gotinên bîrewer û helbestvanê ermenî Eboviyan hate bîra min, ewî weha nivîsî bû; di demekê de nivîskarekî helbestên xwe ji min re şandi bûn, min ewanan xwendin û min bersiva wî bi vî rengî ji wî re nivîsî “Erê te mîna wênekêşekî dixwast wêneya hespekî nîgar bikî, lê mixabin bi te re wêneya kerekî çê bû”. Lê xaziya niha Ebovîyanekî Kurd jî heba, ewî bê guman dê li ser her rûpelekî ji rûpelên Hêmen Kurdaxî wêneya hespekî rewan bidîta, ewî bidîta ku çawa pelên dara zeytonê herdem xwe bi peyv û hestên Hêmen diparêze, û damarên xwe bê tirs berdide nav cegerê Hêmen, ewî bidîta ku çawa Hêmen dişewite lê dîsan ewa namre, ji ber ku ewa heroj, her şev, li ber ronîya hêvê, di taristanê de, ji axa xwe re, ji deşt û çiyayên xwe re, ji hehecîkan re, ji dilên kizirî re, li ber çogên zarokan limêj dike û riya bûheştê ji xwe re di nav herdu çeman, Dicle û Feratê de dûz dike.. ”.



Li gor zimanewanî û sîmolociyê (pêzanîna danîşanan ) navnîşan gelek giring e, ewa berdergehê deqê( mijarê) ye, ewa kilîteke ji kilêtên mijarê ye, ewa deriyek ji deriya ne ku xwendevan di wê re derbazî hundirê deqê dibe û eger em pir kin bibirin; navnîşana serkewtî mîna mijareke serbixwe û zortir e?, riweştên derûnî yên mijarê di navnîşanê de vedibrûse .

Xûya ye; Hêmen pir rind zane ku delamet û giringiya navnîşanê çî ye ? Ewî çel helbestên xwe, ewî çel keskesorên xwe, ewî çel balindên fireşteyên zarokên xwe bi navnîşanekê di eniya xwendevanê xwe de bi êş û dilşadî mor kiriye:

**“ EZ BIŞEWITIM.....**

**DÛMANA MIN JÎ WÊ JI TE HEZBIKE”.**

Di dema ku min bi hiş û weşa xwe di zeviya hestên helbestvanê me de seyran dikir, min di xewneroja xwe de didît ku agir bi benderên gundê Qermîtliq ketiye û çel Hêmen li ber alafa wî dikin qîrîn û hêdî hêdî dişewitin, lê ewanan namirin, nehênîyên vê çi ne? Tenê kaniya helbestan, hêzên pêlên wan û çend stêrk li ezmanan dizanin!!!

“.....

**Îro çiyayê Cudî dişewite**

**Duh jî şewitî...**

**Hêjî dişewite....**

**Îro.....**

**Dilê şaristaniyê dişewite**

.....

**Em zanin ku tu serî danaxî**

**Ne jî Gabar û Besta...**

**Lê çivîkên xwe şiyar bikin**

**Bila bifirin**

.....

”

“....

**Mîna çemên " Rhein" "Ural" û " Donauê"**

**Xwîn di damarên me de diherike...**

.....” Rûpel (11-16)

Li gor rexnevan mamoste Heyder Omer nivîsî ye; helbestvanê Erebi hîn beriya hezar salî gotiye “Wate li ser rêkan weşandî ne, her kesek dikane wan ji xwe re bide hev, lê ne her kesek dikare wan ji wan wateyan bixe hundirê durvekî hunerî yê ciwan..”. Rastiya van gotinên jorîn li nik helbestvanê me di devê pepûkeke bedew de çim dide, her xwendevanekî çêşker dikane di helbestên Hêmen de dûrvên hunerî yên ciwan bibîne, lê Hêmen ne tenê bêjeyên qeşeng ji gulistana zimanê Ehmedê Xanî, Meleyê Cezîrî, ji deşt û newalên Kurdistanê vebjartine û ewanan li pişt hev, yan li ser hev bi awakî tewşankî sîwar kirine, lê belê, ewî bi terzekî hunerî pir bala, bi hestên gelek kûr kardayî û armancên zayîna helbestên xwe diyar kirine. Lewra li nik wî, “Huner ne ji bo hunerê ye”.

“.....

**Gelek çiya di hilmeke min de dijîn ...**

**Deriyên ko koçkên tarî,**

**Di paş bijangên min de kutikkirî ne.**

**Û ji ber wê jî –sîngê min bi êş e!**

**Her bi xwe de diqîrim:**

**Rojekê tuyê çiyak bî**

**Û van valahiyan tijî gund bikî...**

.....” Rûpel (8)

Dîsan rexnevanê Rusî yê di wêjeya cîhanî de nasdar Bêlînskî nivisîye; “Huner di wêne da raman in”.

Em wateya vê gotina jorîn gelek bi sanahî li nik hunera Hêmen dibînin. Hêmen bê westandin ramanên xwe dike rêjeya wêneyan û pir bi lezgînî jî hunera xwe dike rêjeya ramanê û van

herdu aliyan bi pisporî li ber ahengên kenîn û giriyên sê qurnefîlên xwe, li ber sazên “zemawendên cinan” li tevnê dixê. Li cem wî rawestandî di jiyana helbestê de tune ye, yanê helbest herdem di nava xwe de di guhertinê de ye, jiyandar e, pir caran du rudawên dijhevî û bi şewakî felsefî diyardeyeke nûh diafirîne, eva jî bi xwe, di helbesta nûjen de, egereke zor payebilind e .

“..

**Rengên ronahiyê**

**Di hundirê hev re derbas dibin**

**Girêkên dawî,**

**Xwe bi diranên xwînê guvaştin,**

**û di bin qêrîna hestên me de**

**veşartin**

.....

**Nerm daket**

**Bedew bû**

**Biharek ji hilmê firiya keskesorê..**

..... ” Rûpel (76)

Hêmen Kurdaxî bi vê berhema xwe ya sêhem jî, wêjaya Kurdî bi giştî û helbesta nûjen bi taybetî gelek dewlemen kir, em pir bi hevî ne, ku helbestên Hêmen bi pênuşên wergervanên zimanê Erebbî û zimanên din biyanî werin wergerandin, ta ku helbesta me ya nûjen, bê şermî li dergeha wêjeya cîhanî bide. Li dawiyê em lêborîna xwe ji helbestvanê me Hêmen û ji hemû rexnevanên pispor dixwazin ku me nikanî bû dengên van helbestên resen mîna rexnevanekî bigandana xwendevanan, me xwest, em tenê nêrîna xwe weke xwendevanekî helbestdost pêşkêşî we bikin.

---

**Tutlîngên, 4.3.2008, Aleman**

## Kurtepist

Di şevê kal de  
Di hundirê tirênek pîr  
de  
Di nav xurxura siwaran  
de  
Li paş min  
Kurtepista du jinan tê  
Kurtepist:  
Nizm e...  
Dûr e...  
Ne pend e...  
Kurtepist:  
Eşkere ye...  
Bilind e ...  
Di şevê kal de  
Di hundirê tirênek pîr  
de  
Di nav xurxura siwaran  
de  
Xewa siwaran de  
Bablîskêk rûniştiye  
Di kursiya min de !!...

## Daxwaz

Bila...  
Tu teşî bî  
Bila ez rêş bim..  
Bila ...  
Dem li cobela evîna me  
Mîna pîrek çarde salî  
rûne...  
Bila  
Teşîya xwe birêse...

## Al

Gava ba dikeve..  
Reng di cawê alê de  
Xilmaş dibin...  
Al bi ser stûnê xwe de  
Diçelmise...  
Êdî bawo mekeve..  
Êdî bawo meşkeste...  
Êdî bawo rameweste..  
Vê alê;  
Li ser çiyayê xwîna min  
Şîn daye  
Êdî bawo...  
.....

## Awazê Kalo

Xweziya  
Gulek bama  
Di gulîstana te da  
Mûmek bama  
Di sersala te da  
bihatama şewitandin  
Stêrkek, hêvek, roniya  
şeva te bama  
Hîmek, zinarek, çiyakî  
te bama  
Tîpek ji navê te bama  
Awaza sirûda te bama  
Çîrokek, dastanek  
Ji folklorê te bama  
Welato

## *Fêvî û gazin ji demê*

Di kernevala mirina te de  
Simbêlên xwe ,  
Badan....!!  
Ji xewnên te, yên tenik,  
Roj revandin....  
Demên te ..  
Bê ken diman...!!  
Û lêvên te , ji bahozê re  
Bûne lîzgeh û  
Sera.

\*\*\*\*\*

Di sînorên bayê evîna te de,  
Roj û gul sêwî  
Diman,  
Û sawîrên te,  
Di newalên  
tirsê bê tirs de,  
terpilîn , û ji rê ketin  
erê .....

ji rê ketin.

\*\*\*\*\*

Dem , ne dema me bû,  
Ji pencera me,  
xew revî ,  
û sihesiha sînga ramanên te,  
li bayekî rehwan  
siwar hatin.  
sirûda wêneyên te ,  
ji jiyana bê jiyana re,  
ji asmanê bê stêr re,  
ji kilên çavnedîtî re,  
ji min .....re,  
ji te .....re,  
sîng û berê bê dengiyê  
bûne , dê .....û bav.

\*\*\*\*\*

Vîxana min û te,  
Gêj dibû,  
Di nav çiyayên  
Qoqa û parsiwên  
Çavşikestî de,  
Gemara jîne ,  
Xwe paldaye ser mijankên  
Çavê te ,  
Xuristiya kenên li ser



Evîna min ji bîr neke  
Mayîna çêja wê  
Li ser lêvên te  
Reh berdane,  
Ji demên kelogirî re ,  
Sirûda windabûyî ,  
Ber bakirin,  
Ez û te.....  
Ji asoya evîna  
Mem û Zînê re  
Bûn pena...  
Li ser sînga te  
Dîlan girêdan ,  
Û ji Beko re ,  
Şev kirin kiras,  
Û kefxwê jê re kirin  
Av û mey.

\*\*\*\*\*

lêvên te,  
bin axkirin,  
li ser gora beyanên te  
bi şûr navê xwe nivîsandin,  
û tîpên helbesta te  
bi wê de dan....!

\*\*\*\*\*

Çima ...?  
Çima xecxecok  
Di baxê helbesta me de,  
Di bin kumê demê de ma?  
Û dem pê kenî ?  
Xirecira min û te  
Bê tewaşe tim riye?  
Çima .....?  
Çima li ser tîrêjên  
Westiyayî ,  
Pelên payîzê raxistin,  
Û sînor ..  
Çewt li hev  
Siwarkirin??

Nûşîn Bêcirmanî

---

### Kurteçêrok

## **Mêvanê Şemo**

### **Merwan Berekat**

**D**em zivistan bû... mij û dûmanê rê li rêwîyan wenda kiribûn , asîman bi berê xwe yî giran, dem di geroka fîrtenan de dibir û tanî, çûk û çivîkan di qulên şikêran de xwe veşartibûn. Mamiz û kewan wêneyên dîmenên Biharê, tîna rojên Havînê, û carna jî sîmfoniya weşeka daran li demsala Payîzê li bîra xwe tanîn, ew û suruştê di cenga hev de bûn. Perpûrên berfê hêdî hêdî dihatine xar, bedena çîyan wek bejna bûkan bi rengê sipî dixemiland, roj di dawîya pîrbûna xwe de bû, şevê hêdîka konê tariya xwe di ser stûnên demê de berdida, di malên axî de sîmfoniya çipçipên dilopan xew bi zarokan xweş kiribû, dûyê qurmên zeytûn û benîştokê di dûkêşên pixaran re bere asîman hildikşîyan, ji dûr ve wek tirênên destpêka sedê bîstan dihatin xuyan kirin. Jiyana perîşanan xem, qisawet û dijwarî bûn, perîşaniyê pêşbirî li perîşanan birî bû, zikên kun û kûpên moneta wan li ber valabûnê bûn.

Şemoyê perîşan li ber agirê qurman pala xwe dabû balgiyekî ji kepekê, û strana Xirfano ji pîra xwe Besê re distira, berî ku stranê bi dawî bike û bibêje :

**Xirfan xortê Kurda ye**

**Revand keçka tata ye.**

Deriyê mala Şemo hate kutan, Şemo bi lez rabû got ew kî ye? Û bi gotinê re derî vekir, wî dît ku rêwiyek li ber deriyê malê ye, Şemo bi dileşq gote wî, fermo... fermo, sar e serma ye, heyama berfê ye, derbasî malê be, agirê pixarê guregure, bi tev pêt in, fermo derbas be xwe germ bike. Rast e comerdîyê xwe di Şemê perîşan de baş leqand û wî mêvan derbasî malê kir, lê ji aliyekî din de jî tinebûn û perîşaniyê carna comerdîya wî dihejand, ew

mijûl dibû, ka ewê çawa kanibe mêvanê xwe bi şîv bike, ji ber ku di ber strana Xirfano re, Besê bi Şemo re gotibû: Dîsa perîşanî dike benê xwe li nava me bişidîne, bi wê gotinê re Şemo nas dikir ku xwarnên malê berve dawiyê diçin, yan jî nemane.

Piştî mêvan derbasî malê bû, Şemo û mêvanê xwe ve her yek li aliyekî pixarê rûniştin, Şemo carna agir gur dikir, lê çavên wî li şivliva Besê bûn, wî bi xwe re digot: Ma gelo... tişteke dê ji bo şîva mêvên hebe yan na, mêvên jî nas dikir ku çavên Şemo çî pirsan dikin û ew di çî heyamê de dileqe.

Mêvên xwe bi Şemo daye naskirin û got:

Her deriyê mala min ji rêwiyan re vekirîbû. Ez ne perîşan bûm, lê demê ez perîşan kirim. Ez maldar bûm... xwedî ga û pez bûm, bi komê qulik û şe'ra herîrî bûm, şûr û xencera zîvî û zêrîn bûn, bi ode û eywan bûm, ne di qabên axî de bûm, taştêya min qeymaq û hinguvê telaq bûn, vexwarina avê bi piyala cînciqî bûm tu carî ne qelaz bû, razana min li ser doşeka ji hiriya beranan bû, ne li ser mînderên ji mûyê biznan bû. Belê balgiyê min ji liva berxan bû, hespê min kumêt bû nalên wî ji zîvê kildayî bûn, hîrhîra wî di herêm û êlê de nas bû, li nêçîra ahoyan tîrkevanên min şaş ne dikir û tajiye sor nêçîra min birîn ne dikir.

Piştî ku mêvanê Şemo kesereka kûr kişand û rondikeka sêwî ji çavên xwe bi dizî veqetand, ji Şemo re got:

Birako... rezê min li ber riya êş bû, min tucarî kes ji nav venegerand, sifra min zo tejî bû, nanê wê ji genimê sorik û gewrik bû. Pezê min ne bi zengil û xirxirk bû, ew bi baloz û girgah bû, bêrîvanên du danan, ne pîr û piştîxûz bûn, ew keçikên çarde salî bûn. Piştî ax û ofeka dirîreşkî, kesereka tengijî kişand û berda, wêneyê çavên Şemo di çavên xwe de perwaz kirin, got: Birako piştî ev maldarî û dewrana ku min ji te re gotine, îro ez di celê zivistanê de, bûme rêwîkar û nanê cehî bi min goştê berana

ye, perspanên li şewlerê min bersiva rewşa min didin, û eger tu bixwazî sedema xizaniya min binasî ezê bi tere bibêjim :

**Li paş her xweş jînekê baş jinek heye.**

Lê jina min Fata rûbûdike, ew jehra di rehên jînê de ye, bûye kunda şêkiran û mala min kiriye şikêrka gundan.

Raste guhê Şemo li ser gotinên mêvên bûn, lê kutkuta dilê wî bû, lê belê wek hatiye gotin:

**(Jina jin be, eniya mêr wê her hilmîştî ye).**

Berî ku mêvan gotinên xwe bi dawî bike, Besê sifreka gorerewşê li pêş Şemo û mêvên danî, dema çavên Şemo li sifre ketin, pêlên dilê wî daketin, dêmê wî geş bû, lingek berda û yek kişand û tajaneka ciwanan da bejna xwe, te digot belkî nû bi jiyane ket, piştî xwarin û vexwarinê, Besê her yekî ji wan mistek mûj û lepek hijîrên hişk jî xiste dawa şelexerên wan, di ber xwarina mûj û hijîran re, Şemo û mêvanê xwe rewş û jiyana xwe bi hevdu re hewal didan. Şevê dem didiziya, tajan û bawîşkên xewê êrişên xwe didane ser Şemo û mêvanê wî ve, û hema her yek ji wan di cihê xwe de mitêlek avête ser xwe û razan. Roja din piştî taştexwarinê, mêvên berê xwe daye Şemo û got : Şeva çûyî berî ku sifre li pêşiya me were danîn, min wêneyên dêmên te dixwandin, min zanî ku kutkut dilê te bû, û pir caran jî tu ji peyva min diqetiyayî, di hiundirê xwe de bi şivê mijûl dibûyî, lê piştî ku Besê sifre amade kir dêmên te jîn jeniyan û pêlên rehên te rawestiyan. Belê...

**Kilîta mala te zêrîn e**

**Kesek wek wê nîne**

**Ew kaniya jînê ye,**

**Her ava xwe di rehên te de dirjîne.**

Dema ku mêvên gotinên xwe bi dawî anîn, xatirê xwe ji Şemo xast û berê xwe daye ser oxira xwe. Şemê perîşan bi lez kete

malê û bi Besê re got : Besê... Besê mêvanê me hin gotin anîne ziman, ez nikanim wan ji hev veçirînim, ma rast kilîta mala me ji zêr e, dema Besê ev gotin ji Şemo bihîst, wê zanî ku mêvanê wan hişmend bû, wê berê xwe da Şemo û kesereka pêldengizî kişand, û berda û got: Sêfilbûn (xizanî) zikan birçî dike xewê, mirovan xast û nîvtazî dike, û pir caran jiyana mirovan jî dike avelûl û kefecan, rast e sêfilbûn jehra jiyane ye, lê tucarî ew nikane zora comerdîyê bibe, û ne jî kane deriyan li mîvanan bigre.

Şemo got, ez pîrsa kilîtê ji te dikim, ne perîşanî û comerdîyê ji te dipîrsim, Besê got vaye bersiva te:

**Ji malê re, jin kevan e**  
**Jina jin be, nanê malê genim e,**  
**Ne ceh û zîwan e.**  
**Rast e deriyê malan zilam in,**  
**Lê jin kilîtên wan in.**

Pîştî ku Besê ev bersiv da Şemoyê perîşan, wî bi dileşq Bes himbêz kir û eniya wê ramûsand, bi dawîkirina ramûsanê re, gotinên bav û bapîrê xwe li bîra xwe anîn û got: Besê bi xwedê her bavê min digot:

**(Jin hene gul in, jin jî hene kul in).**

Û bapîrê min jî digot:

**( Hişê jinê berî bejnê ).**

---

S		S
p		p
a	a	
	s	

## Rosê Ausländer

Wergerandina ji Almanî:  
Tengezarê Marîî

**L**i zernowitz/Bukowina li roja 11ê Gulana sala 1901ê de, **Rosalie Beatrice Ruth Scherzer** ku bi navê **Rose Ausländer** tê nasîn hate dinê. Bavê wê **Sigmund** ji orthodoxên hişk bû, bi Chassidismus û Mystik“ sofizima“ cihûyên rojhilatî prewerde bûbû. Wî xwe mirovekî lîberal û vekirî didît. **Rose** di maleke çavekirî û dinyadîtî de mezin bû. Di herêma ku **Rose** têde jiyaye, çand û kultûra Alman-Nemsawî li wir serdest bû, û zimanê û toreya Almanî ji dused sal de bibû kevnetoreya deverê.



**Rose** ji 1919/1920an de Tore û Fîlosofî li zanîngeha **Czernowitz** xwend û di 1921ê de bi hevalê xwe yê xwendinê re Ignaz Ausländer çûbû USA. Ew li wir di sala 1923an de zewicîn, lê li dawiya 1926an ji hev bidûr ketin û li sala 1930î jî hev berdan.

**Rose Ausländer** li sala 1934an bû hevvelatiya Amerîkî lê piştî sê salan ji mana wê ew nasname jê hat sitandin.

Wê li Amerîka wek Redaktor, Sekretêr û karmendeke Bankê karkir. Lê ji bo ku guhdana dayîka xwe ya nexweş bike, ew li sala 1931ê vegeriya Czernowitz. Wê li welatê xwe, wek helbestvan, rojnamevan, wergervan û mamosteya zimanê Inglîzî karkir.

Li sala 1941ê û ta 1944an, Naziyan bajarê wan dagîrkir û ew xistin zîndanê û karên dijwar pê kirin.

Helbestvan **Rose** di sala 1946an koçber bû û çû bajarê New Yorkê û wê li wir helbestên xwe bi zimanên Almanî û Îngilîzî weşandin. Pirtûka wê ya helbestê li sala 1965 an bi navê **Blinder Sommer= Havîna kor** li Wien hate weşandin.

**Rose Ausländer** di sala 1965an de hate Almaniya. Wê pir ji sefer û geştê hez dikir û ji sala 1970 ta 1988an li Nelly-Sachs-Haus dijiya. Wê bêhtirî 20 pirtûkên helbestî weşandin. Rose Ausländer di 3. 01 1988an de li Düsseldorf çû ser dilovaniya xwe.

### **Berhemên wê:**

Der Regenbogen = Keskesor. Blinder Sommer= Havîna kor. Brief aus Rosen= Nameyên ji gulan. Denn wo ist Heimat?= Êdî ka welat?. Die Musik ist zerbrochen= Mûzîk şikestî. Die Nacht hat zahllose Augen= Çavên şevê bêhijmar hene. Die Sonne fällt= Roj dikeve. Hinter allen Worten= Li pişt hemî peyvan. Sanduhrschritt= Gavên si'eta qûmê. Schattenwald= Sîbera daristanê. Schweigen auf deine Lippen= Nemukurhatina li ser lêvên te. Treffpunkt der Winde= Pêrgêgeha hevdîtina bayan. Und nenne dich Glück= Navê xwe deyne bext. Wir wohnen in Babylon= Em li Babîlonê dijîn. Wir ziehen mit den dunklen Flüssen= Em dê bi çemên tarî re kişin.

### **Xelatên ku Rose Ausländer wergirtine:**

1967   xelata   Droste   ya   bajarê   Meersburg.  
1977        xelata        Ida-Ehmel        GEDOK.  
1980        xelata        Gandersheimer   ya   toreyî.  
1984 Xelata toreyî ya akadîmiya Bayerên ya ciwaniya huner.

### 1. Reng I

Ez dê newestim  
Temaşe bikim  
Laşên bedew  
Spî reş zer  
Westiyam guhdarî bikim  
Axaftina kirêt  
Li ser ciwanan  
Gelo hizra te  
Reş zer an spî ye?  
Divêm te nîgar bikim  
Mîna bejna keskesorê  
Textê min ji hemî rengan hez  
dike

### 2. Ji bo ronî hez ji me neke

Hatibûn  
Bi aliyên tûj de û demaŋeyan  
Qurşîn berdabûn stêran û heyvê  
Ji bo ku ronî bo me nemîne  
Ji bo ku ronî ji me hez neke  
Ji ber me roj binax kiribû  
Tarîrojeke bêdawî bû.

### 3. Desthildan

Xewn  
dijî  
jiyana min??  
digihê dawiyê.

### 4. Bê vîza

Bê vîza hatime dinê  
Ew çavên xwe miç nake  
Mîna me gumanbar e  
Ez paçekî spî bilind  
dikim  
Li ser birca meyzekirinê  
Li hemî hêlan  
Hêviya bo xwe çê dikim  
Vîza bi hêla evînê de  
Di baweriyên kes de  
Zîl didim

### 5. Dest ji me berdin

Me wek em in  
Bihêlin  
Helbestvan in  
Ji mer re bihêlin  
Viyana peyvên me  
Ponijîna me  
Peyvên me  
Nedin  
Bi hestên wan  
Me bihêlin  
Di nedemên me de  
Xemgîn an jî kêfxweş  
Hun dilreq in  
Berxwedêrên hişweriyê.



## 6. Peyv

“ li destpêkê  
peyv bû  
û peyv  
xwedê bû”  
û xweda  
peyv da me  
û em bi cih dibin  
di peyvê de  
û peyv  
xewna me ye  
û xewin  
jiyana me ye

## 7. Asîman

Dayîka min  
Zemîn  
Diyarî min kiribû  
Û bo min  
Temî li asîman  
kiribû  
wî...  
ê dayîk dabû  
û biribû

## 8. Çareserî

Ez sînd dixum  
peyvâ çareseriyê  
evîn  
e

## 9. Lotik

Di nav lîvanan de jî  
Lotikek heye  
Li wir  
Bêhnê vedidin  
Roj berf  
û baz  
li nêçîrekê digere  
ew nakuje  
xewna min  
bi berfê direqise  
bi rojê  
gerim dibe  
xewna min  
êşeke bi kêf e  
ji gelek beşan e  
feriştayê min ê  
parêziyê digere.

## 10. Sabbath II

Ev roka  
Çermê zemîn  
Tenik e  
Çeqo\* dinive  
Agir radize  
Li ser xeta porê dayîka min  
Feriştaya aştiyê  
Zêrevaniyê li malê digire  
Nanê spî û mey  
Mêvanê şahê me  
Em distirênin  
Heft rojan  
Em nedengkirî  
Xwe qure dikin.  
\*çeqo: kê

### 11. Rondik

ew êgir vedikujin  
ê di hinavê te de  
pêketiye  
li ser fermana  
saniya têwerkirî  
ji çavên te digindirin  
ser rêçerûçkên te  
û bi jêr ve  
kesek xwe nawestîne  
ew daxwaza destûrê  
li te nakin  
xudî firmêskên dilpak  
deryayên hinavê te ne.

### 12. Godot

di betlanan de  
hevalên mirî têne seredana  
min  
çîrokên naskirî  
ji min re vedibêjin  
ên min ew ji bîr kirine  
kî bi min re dijî  
ku hertiştî dizanin  
sûnd dixun  
ez naxwazim  
hertiştî bizanim  
bendewarê Godot im  
dibêjim  
ew li azmên in  
tehdîd dikan  
ez bilind dibim  
dibe ku ez  
carekê bigihim azmên

### 13. Kî me ez

dema ez tevlîhev bim  
helbestê dinivîsim  
çaxê dilxweş bim  
helbest xwe  
di min de dinivîse  
ez kî me  
dema ez ne-  
nivîsim. !

### 14. Bêwar

di baweriyê de dijîm  
di nav livîna xwe de  
silavê didim  
berambervanên  
rêgayên ne li astekê  
bo te û  
hin din  
û xwişk û birayan.

### 15. Peyv

em dijîm  
peyv bi peyvê ve  
ka bêje min  
hevalê te  
ê herî baş kî ye  
ê min  
TU

### 16. Kilît

kilîta min  
mal winda kiribû  
ez ji malekê diçûm ya din  
her lê nayê  
kilîtsaz  
min dît  
kilîta min  
li gora wî tê

# Dirav

## Rêberê Silîv

**D**i civaka me kurdan de, hin dibêjin: Mal û dirav, qiloçên zilaman e. Hin jî dibêjin: Mal, gemara destan e, ew diçe, dîsa vedigere...û hwd.

Di ola Islamê de jî li ser mal û dirav hatiye axivtin. Xwedê di pirtûka xwe ya pîroz de gotiye: "Ew kesê zêr, zîv û pere civandine û veşartine, tu qencî di riya xwedê de bi wan nekiriye, roja dawiyê, ezê parsû û aniya wî pê dax bidim."

Li ser zimanê Muhemd Pêxember silavên Xwedê lê bin jî hatiye gotin ku : "Ew mirovê di ber xak, namûs, yan diravê xwe de bê kuştin, ew mirovekî şehîd e.". Herweha dîsa li ser zimanê wî hatiye gotin: "Giring e bawermend ji bo dunya xwe bixebite her wekî ewê ta ebed tê de bijî, û ji bo xwedayê xwe jî kar û xebatê bike, her



wekî ewê sibe bimire"...û hwd.

Gelek fêlosûfên mezin ên jîr û zana jî li ser dirav û peran nerînên cuda cuda anîne zimên.

Diyar e, ku gelek nerînên li derbarê dirav û mewdan hene, her nerînek, ji gûşeyeke jiyane de lê temaşe dike.

Rêz û rûmeta min a giran ji her nerînekê re heye, û bêguman e ku cudahiya nêrîn û baweriyan mak û jêdera pêşveçûna jiyana ramiyarî ye, giring e mirov gotinên pêşiyên û pendên wan bi hûrbînî bixwîne, sûd û

kelkê ji wan bigre, ji ber ku ew ji dibistana jiyanê hatine afirandin û bi gel re ta roja îro jiyane.

Herweha divê mirov ji bîr neke, ku hin ji wan gotin û pendan, îro ne li gora dema me ne, çinkî nerîna civakê jî bi demê re ji gelek tiştan tête guhertin. Ez dixwazim bibêjim, ne her tiştên ku li ser zimanê pêşiyên me ji sedên salan de hatine gotin, hemî rast, durst û li gora dema me ya îro ne, û ne jî ew hemî pûç û vala ne.

Bêgoman e, berê û îro jî, rola dirav û peran di jiyana mirovan de roleke mezine, ji ber ku ji her kar, her lebt û tevgera mirovî, hebûna dirav û peran pêwîst e. Tu zeviya xwe biçînî, tu av bidî, tu biçînî, pere gerek in. Tu herî bajarekî ji bo derbaskirina çend rojan, eger te pere nebin yan dostekî te li wî bajarî ne be, tê li kolanan razî, tê şerpeze bibî. Ji ber vê rola peran di jiyanê de,

hin mirov nema xwe li ber çirisandina zêr û zîv digrin, hema yekser serê xwe jê re diçimînin, û her tiştî jê re dikine gorî, ew ji bo civandina dirav, dikarin karên bê rê yên dûrî sincên mirovtiyê bikin. Ew dikarin ji bo civandina dirav û peran mirovan bikujin û pereyên wan ji xwe re bibin. Ew dikarin xwe bifroşin dijminên welatê xwe, xiniziyê ji wan re bikin, kî dimire, kî dimîne, ji wan re ne problem e û ne jî cihê rawestanê ye, ta radeya ku ji bo civandina dirav û peran, hin mirov dikarin zarokên piçûk ji ber devê deriyên wan birevînin, wan bikujin, gurçik, dil û kezeba wan bifroşin...!!  
Li hêleke din, dîsa jî bi armanca danheva dirav, zêr û peran, hin nivîskar, helbestvan, dîroknivîs ...û hwd, bi erzanî bextê xwe difroşin, berhemên derew diweşînin, pesnê wan mirovên bê hest û bê ol didin û rastiyên dîrokî diperçiqînin.

Gereke mirov di her merc û heyamê de mirovatiya xwe winda neke û nebe teba, nebe hov û dewar, ewên gepa xweş ji ber devê hevalên xwe direvînin, ne tenê wilo, ew birayê xwe didine ber lep, gez û poçan, wî ji xwarina wî dûr dikin, ew zikên xwe didine ber û dixwin, û haya wan ji birçîbûn û hestên birayên wan tune ye..!!.

Divê mirov di jiyana xwe de bê westan ji bo mal û zarokên xwe kar û xebatê bike, nehêle zarokên wî birçî, xizan û perîşan bibin. Ji ber ku pêşiyên me gotine: "Destê westiyayî li ser zikê têr e", ango, divê mirov ne betal û tiral be û çavên wî li destê meriv û dostên wî be, çiku mirov bi vê yekê şermezar û riswa dibe, û di civakê de bê gotin dibe, dîsa pêşiyên gotine: "Şixulkerê mala xwe be, hezkerê ber dilê xelkê be". Ew mirovê karibe karê

xwe bike, zarokên xwe xwedî bike, rûmeta xwe jî pêre bipolarêze, bi kul û xemên civaka xwe re bi erênî têkildar be, ew mirovekî pir hêja ye.

Di siha tunebûna yasayê de, mirovên bê sinc û perwerdeyeke çak, har û dîn dibin, qiloç û mermûl bi wan ve çêdibin, destên xwe davêjin mal û namûsa birayên xwe, ew dibine dirinde, bi hinera zêr û pereyên xwe rûmeta mirovan bînpê dikin. Lê, di siha hebûna yasayê de, her kes sînore mafên xwe nas dike, ew jê pê ve, nikare lingê xwe bavêje, ji ber ku zêdegavî, berê wî dide zindanê. Mirov dikare bibêje, eger yasa li welatekî hebe, nirxê mirovan ji yê dirav û peran bêtir e, eger yasa têde nebe, nirxê dirav ji yê mirov bêtir e, ew jî bo mirov û mirovatiyê daxeweke pir mezin e.

**Z**ivistan werzeka leqok e, rojên wê hevdu nagrin. Folklor û zanîna gelêrî ew parve çend dembirkan kiriye û her yek jî navek lê kiriye.

Zivistan nod roj e, çel rojên wê yê destpêkê bi Çeleyê zivistanê hatine binavkirin, Çeleyê zivistanê li /21/ê Kanûna yekemîn dest pê dike û li /29/ê Kanûna diwemîn bidawî dibe. Pêncî rojên zivistanê yên din jî parve çar dembirkan bûne û bi navên cuda hatin binavkirin. Ew dembirkên ji roja sî yê Kanûna diwemîn de dest pê dikin û ra /20/ê Avdarê dajon. Her dembirkek ji wan jî dozde roj û nîv e.

Ew dembirk wiha li pey hev tên û binav dibin:

1. Dembirka pêşin Jê re dibêjin **Kecok**: Çima ev nav li vê dembirkê bûye? Kecok keçek xwînsar e, pir ji xwe hez dike û xwe pir hêja dibîne. Her carê ku xwazgênciyên wê tên, ew xwe dide ber çek û dûzanê û xwe dixemilîne, lê bext lê

venabe û dûzan û xemila wê li arê diçe; Çimku çaxa ku xwazgênciyên wê xwînsariya wê dibîne destê xwe jê sar dikin û jê bi dûr dikevin, wê hîngê dilê wê jî dişkê û ew xemsar û dilsar dibe, loma jî ev dembirk bi navê “Kecok” binav bûye.

Kecok ...kecok bûka zivistanê ye, piştî rihela çel rojî, xwe dide ber çekûdûzanê û pir şaye, lê nizane ku baran dê baran nebare û bext dê lê nevebe.

2. Dembirka Baranbarînê: Baranbarîn avê bi kunan tine xwar, zeviyan têr av dike, kaniyan der dike.

3. Dembirka Sermakujê: Sermakuj agiran kêr dike, roj bi rojê milan ji kurk û kulavan azad dike û dilan xwaş dike.

4. Dembirka Pêşbiharê: Ew li dawiyê tê. “Pêşbihar bi hev re digêrîne dost û yar”. Heyam têde xwaş dibe, ro bi tîne dibe û kes li ber agiran namîne û li dawiya wê bihara xwaş û rengîn dest pê bdike û sipeha li dû wê Newroza rengîn e.

## Qelewbûn; rûdawa buveh!

### Qelewbûn; rûdawa buveh!

**L**i gor lêkolînan, gernasên Emerîkî dupat dikin, ku li ba mirovên bi rahênanên werzişî ranabin, her temenê wan mezin dibe, giraniya wan jî zêde dibe.

Li gor wan şarezayan, dema ku temen mezin dibe, govde tibaba masûlkên xwe ji dest dide û tibaba don di xwe de bilind dike. Û herhiha ew rastî neçar dikin ku em şêweya jiyana xwe biguhêrin.



Gernas Colî Şwertz şerezaya dankirinê li Kolîca Bijîjkiyê ya zanîngeha “Îmorî” dibêje, gerek em zanibin em mezin dibin, û em her deh salan tibabekê ji masûlkên xwe jidest didin. Û kêmbûna livê ligel kêmbûna şewtandina xwarinê, dike ku don di govde me de kom bibe.

Şwertz diyar dike, ku di pêvajoya mezinbûna mirov de, rûdawên bilinbûna giraniyê li ba jinan û mêran jev cuda dibin. Piraniya jinan don di qalçe û qorikan de kom dibe, lê li ba mêran di hemî deverên zik de kom dibe.

Ji bo dupatkirina metirsiyên kombûna don di govde mirov de, zanîngeha “Harvard” û zankoyên netewî yên tendurustiyê li SEY, li vê dawiyê di lêkolînekê de dîtî, ku ew jinên kembera nava wan ji 35 inçan û bêtir e, ji yên nav zirav pirtir bi pençeşêr û nexaşiyan dil dikevin.

Şwertz şîret dike, daku çalakiya şewtandin di govde de bilind bibe, gerek e mirov çend danên biçûk di rojê bixwe, û birina ronaviyan jî pir bike.

Û ji bo ku li dema mezinbûna mirov, û daku ji gelek nexaşiyan werin parastin, Şewrtz şîret dîke û dibêje: Gerek em çalak bin.

Çinkî werzişî gelek sûdan dide. Wek nimûne, bikaranîna werzişa “Êrobîk”ê, gelek don di govde mirov de dişewtîne.

Û li gor lêkolînekê di kovara “Komeleya Bijîşkî ya Emerîkî” de jî belav bûye, werzişvaniya çend kat meş di heftê de, metirsya pençeşêr pêşîrê hindike dîke û tibaba don jî di xwîne û govde de kêr dîke. CNN.

Wergêr: M. Elî

### **Birûskek ji bona Mehrecana Helbesta Kurdî**

Silav û Rêz..

Eger wêje gulîstan e, helbestvan perwane ye, ji her gulekê bîn û rengan dibe, tovên wan tevlêhev dîke û gul û reng û bînen herî ciwan û nazik bi pêlên hestên xwe dafrîne û bi ezmanê mirovatîyê de berdide.

Em bawer dikin ku her helbestvanekî Kurd Perwanke evîndar e, gul û rengên herî delal di gulîstana wêje û bêjeya Kurdî de dafrîne û hêviyan jiyanê azad bilintir dîke.

Em bi navê kovara “Pirs”, komîta amadekar a Mehrecana Helbesta Kurdî û helbestvan û hemî beşdarên dilsoz silav dikin û paşerojê serkeftî ji peyva ciwan û ji zimanê Kurdî yê şêrîn re hêvî dikin...

Kovara Pirs

22.10.2008